Avrupa Birliği ile birlikte ortak finanse edilmektedir

AVRUPA BİRLİĞİ

COUNCIL OF EUROPE

CONSEIL DE L'EUROPE

Avrupa Konseyi ile birlikte ortak finanse edilmekte ve uygulanmaktadır

ULUSLARARASI ÇOCUK MERKEZİ

BÎRNAMEYA PÊZANÎYA BAZIRGANÎYA ZAROKAN

Xurtkirina Komên Bêparastin: Procekta Hayjêhebûna Bêtirkirî û bi Rêya Pêgihana Alîkarîya Hiquqî ya Têkoşîna bi Bazirganîya Zarokan re

Ev weşan, bi desteka pereyî ya Yekîtîya Ewropayê û Encûmena Ewropayê hatiye karkirin. Berpirsîyarîya vê têdeyîyê ya nivîsevan(an) e. Ramanên li vê derê hatine vegotin bi tu awayî ne yên fermî yên Yekîtîya Ewropayê û Encûmena Ewropayê ne.

Ev belavok tenê ji aliyê Navenda Zarokan a Navneteweyî ve di çarçoveya alîkariya ku ji aliyê projeya "Xwetkirina Parastina Mafên Mirovan a Di Çarçoveya Koçberiyê de li Tirkiyeyê" di çarçoveya Bernameya Hevbeş a Pişgiriya Horizontal a Yekîtiya Ewropa û Konseya Ewropayê de tê dayîn, hatiye amadekirin.

Ev wergêrî li ser daxwaza Komeleya Navenda Zarokan a Navneteweyî, ji alî wergera Kurmanci Eşref ELÇÎ'yî ve hatiye wergerandin.

TÊDEYÎ

PÊŞGOTIN 3
KURTE 5
BAZIRGANÎYA MIROVAN Û KOMÊN RESEN 7
Têketin 7
FERMANA QANÛNÎ YA NETEWEYÎ Û NAVNETEWEYÎ 7
ÎSTATÎSTÎKÊN BAZIRGANÎYA MIROVAN 9
LI NIK XERÎTEYA TÊGIHAN BAZIRGANÎYA MIROVAN 11
DÎMENÊN BAZIRGANÎYA MIROVAN 12
BI RÊYA FIHÛŞ Û ÎSTÎSMARA CINSÎ BAZIRGANÎYA JIN Û ZAROKAN 12
BAZIRGANÎYA ENDAM Û ŞANEYAN 14
ZEWICANDINÊN BI ZORÊ 14
PARSPÊKIRIN 14
XWARINA KEDÊ 15
LEŞKERÊN ZAROK 16
TÊKOŞÎNA BI BAZIRGANÎYA MIROVAN RE Û PARASTINA ZIYANDÎTÎYAN 18

PÊŞGOTIN

Bi globalîzasyonê û bipêşveçûyînên teknologîk, ji bo bipêşvebirina parastin û hayjêhebûna mafên hîmî yên mirovan hindek awa û keysên cuda pêk hatine. Lê digel van hemû bipêşveçûyînên erênî yên li ser mafan, rastîyek heye ku ew jî cûrbicûrbûyîna binpêkirinên mafan e.

Çendîn sebebên ku ew di serî de koç, şer, krîzên îklîmê, newekhevî û xizanî ne; bi globalîzasyon û jimarîbûyînê binpêkirinên hîmî yên mafên mirovan ji gelek alîyan ve kûrtir dikin. Bazirganîya mirovan jî xetereke wisan e ku di rewşa ku ev hemû bûyer pêk tên û dijwar dibin de şeref û mafên mirovan bi tiştekî hesab nake.

Beşeke mezin a ziyandîtîyên sûcê bazirganîya mirovan, di serî de hêzên civatî; ji ber gelek sebeban jin, zarok û koçber in.

Em wek Navenda Zarokan a Navneteweyî, bi mebesta parastina mafên zarokan û ji bo wan pêşkêşkirina sibêrojeke ewletir, xebatên xwe saz dikin. Bi procekta me ya me wê bi desteka Encûmena Ewropayê dayî destpêkirin a bi navê "Xurtkirina Komên Bêparastin: Procekta Hayjêhebûna Bêtirkirî û bi Rêya Pêgihana Alîkarîya Hiquqî ya Têkoşîna bi Bazirganîya Zarokan re" jî em li gora vê mebestê xebatên xwe yên li ser zarok û jinan ên ku ew perçeyekî mezin ê ziyandîtîyên sûcê bazirganîya mirovan in, xebatan dikin.

Procekta me; ji bo çêtir fehmkirina zehmetîyên ku koçber, bextxwaz û nexasim jî jin û zarok dikişînin, kartêkerîyên dijwar ên li ser wan û jîyana wan in e. Ji bo ku em xeterên ev kom dijîn kêm bikin, karibin ew xwe bigihînin mafên xwe û wan biparêzin, bi çavekî çaralî dinihêrin.

KURTE

NY : Neteweyên Yekbûyî
BMCBZ : Bi Mebestên Cinsî Bazirganîya Zarokan
ZDZZZ : Zewicandinên Dema Zaroktîyê, Zû û bi Zorê
BTK : Birêvebirîya Tevahî ya Koçberîyê
PPT : PowerPoint
DCS : Dezgeha Civata Sivîl
QCT : Qanûnê Cezayî yê Tirk
NZN : Navenda Zarokan a Navneteweyî

BAZIRGANÎYA MIROVAN Û KOMÊN RESEN

Têketin

Raporta Neteweyên Yekbûyî ya li ser bazirganîya mirovan a ku tê de daneyên sala 2024an tê de hatiye belavkirin di tarîxa 11ê çileyê pêşîn ê 2024an de hat weşandin.[1] Yek ji bidestketîyên herî giring ên ragihandina bazirganîya mirovan a cîhanî jî ya Nivîsîngeha Neteweyên Yekbûyî ya Madeyên Hişbir û Sûcî ye, di sala 2024an de bûyerên ziyandîtîyên ji îstîsmarkirina zarokan û bi zorê xebitandina wan ên bidestketî ji sedî 25 bêtir bûne.

Gava mirov hay ji hêzên cîhanî yên bazirganîya mirovan û taybetîyên neteweyî yên taybet bi Tirkîyeyê heye, tevlî karîgerîya ku li dijî gefeke cîhanî rewşên taybet ên neteweyî pêk tînin, eşkere ye ku em bi teşqeleyeke pir alî û biliv rûbirû ne.

Gava mirov bi çavê fermana qanûnî ya neteweyî û navneteweyî dinihêre, eşkere ye ku hê jî kêmasîyên hiqûqî hene, têkoşîna bi bazirganîya mirovan re divê ji ber vê yekê bi navgînîya mamhostayan û parêzkarên mafên mirovan were bipêşvebirin.

Gava em li fermana qanûnî ya navneteweyî ya têkildar dinihêrin, em dikarin bibêjin ku belgeya herî hîmî; Peymana Têkoşîna bi Sûcên Birêxistî ya Sînorbuhurî ya Neteweyên Yekbûyî (Peymana Palermoyê) û pêveka peymana navbuhurî Peymana li ser Astengkirin, Rawestandin û Cezakirina Bazirganîya Mirovan, Nemaze ya Jin û Zarokan (Peymana Palermo) ye. Ev nivîs di sala 2000an de ji bo îmzekirinê hatine vekirin û Tirkîye, di 25ê Adara 2023yan de bûye alîgirê wê.

Gava em bi çavekî herêmî dinihêrin; Peymana Tevgera Dijî Bazirganîya Mirovan di sala 2005an de hatiye qebûlkirin û ji alî Tirkîyeyê ve di 30yê çileyê paşîn ê 2016an de ketiye rewacê. Ji bilî vê, Encûmena Ewropayê wek hinceteke Peymanê, Koma Pisporên Tevgera Dijî Bazirganîya Mirovan (GRETA)yê saz kiriye.[2]

Wek temamker û hinceta van berpirsîyarîyên Navneteweyî, bi kefteleftên lihevanîna Peymana Palermo, di madeyê 80yî yê Qanûnê Cezayîyê Tirk de sûcê bazirganîya mirovan hatiye bikeyskirin.

Ji bilî van, Fermana Qanûnî ya li ser Têkoşîna bi Bazirganîya Mirovan û Parastina Ziyandîtîyan a bi palpişta Peymana Tevgera Dijî Bazirganîya Mirovan a Encûmena Ewropayê û Qanûnê Parastina Navneteweyî û Biyanîyan a bi jimara 6458an jî êdî bûye perçeyek ji hiqûqê me yê neteweyî.

Tiştek ji tiştên divê bala parêzkarên mafên mirovan ên Tirkîyeyê bikişîne jî ew e ku li gora biryara bi jimara 2020/1.2yê ya Encûmena Birêxistina Têkoşîna Dijî Bazirganîya Mirovan a ji bo Peymana Tevgera Dijî Bazirganîya Mirovan a Encûmena Ewropayê û Fermana Qanûnî ya li ser Têkoşîna bi Bazirganîya Mirovan û Parastina Ziyandîtîyan hatiye sazkirin, Dezgeha Mafên Mirovan û Wekhevîyê ya Tirkîyeyê (TİHEK), di mijara têkoşîna bi mafên mirovan û ragihandinê de wek Dezgeha Ragihandina Neteweyî hatiye xuyandin. Bi sebebê vê peywirê, TİHEK, ragihandina xwe ya pêşîn; Ragihandina Neteweyî ya Tirkîyeyê ya Têkoşîna bi Bazirganîya Mirovan re di Adara 2023yan de amade kiriye.[3]

FERMANA QANÛNÎ YA NETEWEYÎ Û NAVNETEWEYÎ

Gava behsa komên resen tê kirin, awayên wan ên cuda yên dîtinê jî hene. Wek nimûne; gava behsa zarokan, jinan, koçberan tê kirin hêz û dîtinên cuda dikevin rewacê. Di mijara modela hînkirina hînkiran de divê li ser cihêbûnên sazkirina têgihan jî bê rawestîn. Di îklîmeke ku tê de proseyên pirralî yên koçê hem li ser rojeva cîhanî û hem jî xasma rojeva welatê Tirkîyeyê, avahîya wê ya siyasî û ya civatî kûr û dûr kargêrîyê dike, divê li ser awayên bazirganîya mirovan ên li ser komên resen jî bi awayekî cuda bê rawestîn.

Herweha em dikarin fermana qanunî ya neteweyî bi vî awayî biçarçove bikin û ji alîyê nirxandina têgihî ve li ser awayê binavkirina van beşan rawestin:

1 https://www.unodc.org/documents/data-and-analysis/glotip/2024/GLOTIP2024_BOOK.pdf
2 Yek dikare xwe ji vê derê bigihîne awayê paşîn ê Têbînîya Zanîyarîya Rêbera koma GRETA: https://rm.coe.int/guidance-note-on-the-entitlment-of-victims-tr-/1680a37841
3 https://www.tihek.gov.tr/public/editor/uploads/insan%20ticaretiyle%20mu%CC%88cadele%20tu%CC%88rkiye%20ulusal%20raporu%20v06.pdf

Belgeyên Navneteweyî yên Din ên li nik Neteweyên Yekbûyî

- Peymana Xebitandina Bi Zorê ya tarîxa 28ê Hezîrana 1930yî û bi jimara 29an
- Peymana Rawestandina Îstîsmara bi Mebesta Fihûşê û Bazirganîya Mirovan a tarîxa 2yê çileyê pêşîn ê 1949an
- Peymana li Ser Rewşa Bextxwazan a bi tarîxa 28ê Hezîrana 1951î
- Lihevkirina Li ser Rewşa Bextxwazan a pêveka vê Peymanê;
- Peymana li Ser Tunekirina Hemû Cûrên Cihêkarîyên li Dijî Jinan a tarîxa 18ê çilêyê pêşîn ê 1979an;
- Peymana Mafên Zarokan a tarîxa 20ê çîrîya paşîn a 1989an;
- Peymana Tevgera Bi Lez a Li ser Tunekirin û Qedexeyîya Xebitandina Zarokan bi Awayên Herî Xerab a tarîxa 17ê Hezîrana 1999an a Birêxistina Xebatê ya Navneteweyî;
- Peymana Bijarte ya pêveka Peymana Mafên Zarokan a Li ser Pornografîya Zarokan û Bikaranîna Zarokan bi Mebesta Fihûşê, Firotina Zarokan a tarîxa 25ê Gulana 2000î

Belgeyên Navneteweyî yên Din ên Li Nik Encûmena Ewropayê

- Peymana Li ser Parastina Serbestîyên Hîmî û Mafên Mirovan a bi jimara 5 ETS û tarîxa 4ê çîrîya paşîn a 1950yî
- Lihevkirin û Peymana Ewropayê ya Li ser Vegerandina Sûckirîyan a bi jimara 24 ETS û tarîxa 13yê çileyê pêşîn ê 1957an;
- Peymana Ewropayê ya Li ser Alîkarîya Dualî ya di Mijarên Cezayî ya bi jimara ETS 30 û tarîxa 20ê Nîsana 1959an û Lihevkirinên wê
- Şertê Civatî yê Ewropayê yê jimara 35 ETS û tarîxa 18ê çîrîya pêşîn a 1961î
- Şertê Civatî yê Ewropayê yê Nûkirî yê bi jimara 163yan û tarîxa 3yê Gulana 1996an
- Peymana Ewropayê ya Li ser Tezmînkirina Ziyandîtîyên Sûcên Tê de Tundî heye ya bi jimara 116 ETS û tarîxa 24ê çîrîya paşîn a 1983yan
- Peymana Li ser Paqijkirina Hatinîyên Sûcî, Lêgerîna wan, Desteserkirin û Destdanîna wan a bi jimara 141 ETS û tarîxa 8ê çîrîya pêşîn a 1990î
- Peymana Ewropayê ya Li ser Bikaranîna Mafên Zarokan a bi jimara ETS 160î ya tarîxa 25ê çileyê paşîn ê 1996an;
- Peymana Hiqûqê Cezayî ya Li ser Gendelîyê ya bi jimara ETS 173 û tarîxa 27ê çileyê paşîn ê 1999an
- Peymana Hiqûqa Taybet a Li ser Gendelîyê ya bi jimara ETS 174 û tarîxa 4ê çirîya paşîn a 1999an;
- Peymana Sûcê Saybir a jimara 185 ETS û tarîxa 23yê çîrîya paşîn a 2001î

AMARÊN BAZIRGANÎYA MIROVAN

Ragihandina Salanî ya 2020î ya Têkoşîna bi Bazirganîya Mirovan re, GİGM

Cedwela 3yan. Awayên kedxwarîya bazirganîya mirovan (2016-2020)

Awayê Kedxwarîyê/	2016	2017	2018	2019	2020	Toplam	%
Hemû	**181**	**303**	**134**	**215**	**282**	**1,115**	**100,0**
Îstîsmara cinsî	143	186	95	144	160	728	65,3
Kedxwarîya kedê	30	52	39	55	73	249	22,3
Parspêkirina bi zorê	8	65	-	4	43	120	10,8
Zewicandina bi zorê	-	-	-	11	4	15	1,3
Firotina Zarokan	-	-	-	1	1	2	0,2
Bazirganîya Endaman-Tevnê	-	-	-	-	1	1	0,1
Leşkerên Zarok	-	-	-	-	-	-	-

Cedwela 4an. Belavbûyîna temenê ziyandîtîyên bazirganîya mirovan (2016-2020)

Temen/	2016	2017	2018	2019	2020	Toplam	%
Hemû	**181**	**303**	**134**	**215**	**282**	**1,115**	**100,0**
(-) 18	29	98	15	31	165	338	30
Temenê 18-25	63	124	63	74	41	365	32,7
Temenê 26-35	76	61	42	73	56	308	27,6
36 (+)	13	20	14	37	20	104	9,3

Cedwela 7an. Belavbûyîna ziyandîtîyên bazirganîya mirovan li gora wîlayetan (2016-2020)

WÎLAYET/	2016	2017	2018	2019	2020	Toplam	%
Hemû	**181**	**303**	**134**	**215**	**282**	**1,115**	**100,0**
Stenbol	21	48	42	48	98	257	23,0
Antalya	45	66	32	30	17	190	17,0
Riha	10	22	-	3	71	106	9,5
Îzmîr	15	20	14	28	16	93	8,3
Hatay	8	24	7	19	7	65	5,8
Anqere	21	28	8	3	3	63	5,7
Edene	16	8	14	3	4	45	4,0
Bûrsa	12	8	3	3	14	40	3,6
Myrtle	15	18	-	3	2	38	3,4
Mûxla	4	15	-	6	2	27	2,4
Yên din	14	46	14	69	48	191	17,1

Amarên Edlî yên 2023yan ên Birêvebirîya Tevahîya Qeyda Edlî û Amaran a Wezîrîya Edaletê

Serdozgerîyên Komarê										
1.7 Li gora QCTê jimarên dosyeyan, gumanbaran û sûcan ên di heyama lêpirsîna serdozgerîyên komarê de, 2023										
Awayê Sûcî	QCT Made	Hemû			Dewra ji sala çûyî			Yên di nava salê de vekirî		
Qaçaxçîtîya Koçberan û bazirganîya mirovan		Dosye	Gumanbar	Sûc	Dosye	Gumanbar	Sûc	Dosye	Gumanbar	Sûc
	79-80	22 853	40 572	47 756	11 690	24 150	26 817	11 163	16 422	

Dadgehên Cezayî													
2.13 Li gora QCTê jimarên dosyeyan, gumanbaran û sûcan ên di heyama lêpirsîna serdozgerîyên komarê de, 2023													
Awayê Sûcî	QCT Made	Hemû			Dewra ji sala çûyî			Yên di nava salê de vekirî			Yên xera bûne û hatine		
Qaçaxçîtîya Koçberan û bazirganîya mirovan		Dosye	Gumanbar	Sûc	Dosye	Gumanbar	Sûc	Dosye	Gumanbar	Sûc	Dosye	Gumanbar	Sûc
	79-80	13 269	27 919	39 509	7 268	17 766	26 769	5 421	90 088	11 498	580	1 065	1 242

Dadgehên Cezayî													
2.14 Li gora QCT-ê di dadgehên cezayî de di dosyeyên di nava salê de hatine de belavbûna li gora regez, temen û welatîbûnê, 2023													
Awayê sûcî			Tevahî			Welatîyê Tirk Koma Temenî						Welatîyê biyanî	
Qaçaxçîtîya Koçberan û bazirganîya mirovan						12-14		15-17		18+			
	Jimara madeyê QCTê	Bi Tevahî	Mêr	Jin	Nayê zanîn	Mêr	Jin	Mêr	Jin			Mêr	Jin
	79-80	10 007	9 711	293	3	-	-	103	2	7 728	204	1 880	87

Dadgehên Cezayî																	
2.19 Li gora QCT-ê li gora biryarê sûcî di dadgehên cezayî de jimarên dosyeyan, gumanbaran û sûcan, 2023																	
Cûrê sûcî	QCT jimara madeyê	Hemû			Cezaxwarin			Serbestberdan			Bipaşveavêtina Biryarê			Biryarên Din			
		Dosye	Gumanbar	Sûc	Dosye	Gumanbar	Sûc	Dosye	Gumanbar	Sûc	Dosye	Gumanbar	Sûc	Dosye	Gumanbar	Sûc	
Qaçaxçîtîya Koçberan û bazirganîya mirovan	79-80	5 461	8 687	9 561	3 505	5 733	6 411	1 664	2 553	2 672	30	33	33	262	368	445	

Dadgehên Cezayî														
2.24 Di dadgehên cezayî de dosye û jimarên sûcan, cûrên sûcên zarokên bere wan hatiye dayîn sûcan, 2023														
		Hemû			Dewra ji sala çûyî			Yên di nava salê de vekirî			Yên xera bûne hatine			
Cûrê sûcî	Jimara madeyê qanûnên QCTê	Dosye	Zarokê berê wî hatiye dayîn sûcan	Sûc	Dosye	Zarokê berê wî hatiye dayîn sûcan	Sûc	Dosye	Zarokê berê wî hatiye dayîn sûcan	Sûc	Dosye	Zarokê berê wî hatiye dayîn sûcan	Sûc	
Qaçaxçîtîya Koçberan û bazirganîya mirovan	79-80	420	384	559	230	244	316	171	123	224	19	17	19	

Dadgehên Cezayî																	
2.25 Di dadgehên cezayî de li gora cûrên sûcên zarokên berê wan hatiye dayîn sûcan jimara dosye û sûcên biryarê wan hatiye dayîn, 2023																	
Cûrê sûcî	Jimara qanûnî	Hemû			Zîndanîkirin			Serbestberdan			Bipaşveavêtina Biryarê			Biryarên din			
		Dosye	Zarokên berê wan hatiye dayîn sûcî	Sûc	Dosye	Zarokên berê wan hatiye dayîn sûcî	Sûc	Dosye	Zarokên berê wan hatiye dayîn sûcî	Sûc	Dosye	Zarokên berê wan hatiye dayîn sûcî	Sûc	Dosye	Zarokên berê wan hatiye dayîn sûcî	Sûc	
	79-80	115	116	126	70	68	76	2	24	24	12	12	12	11	12	14	

DI MIHWERA XERÎTEYA TÊGIHÎ DE BAZIRGANÎYA MIROVAN

Bazirganîya Mirovan

- "(a) Maneya bazirganîya mirovan; bi bikaranîna hêzê yan jî gefa bikaranîna hêzê yan jî bi awayekî din bi zorê, hîleyê, xapandinê, bi xerabî bikaranîna hêzê, ji feydedîtina bêçareyîya kesî yan jî ji bo qezenckirina aferîna desthilatdarê destûra wî ya çavdêrîyê heye ji wî kesî re yan ji kesên din re bi rêya bidestxistina qezencê yan feydeyê peyderkirina kesan bi mebesta îstîsmarê, ji derekî ber bi derê din ve veguhestina wan, dewirkirina wan, vehewandina wan yan teslîmsitandina wan e. Dê di têgiha îstîsmarê de bi kêmayî îstîsmarkirina fihûşa kesên din yan awayên din ên îstîsmara cinsî, xebitandina bi zorê yan pê kirina xizmetê, dîlbûyîn yan pêkanînên wek dîlgirtinê, koletî yan sitandina endaman hebe.
- (b) Eger bazirganîya mirovan bi awayekî di benda (a) de xuyandî hatibe pêkanîn, ziyandîtî ji îstîsmarê re erê kiribe yan nekiribe ew yek rewşê naguherîne.
- (c) Hîç awayekî benda (a)yê di vê madeyê de tune be jî, bi mebesta îstîsmarê peyderkirina zarokî, ji cîhekî ber bi cîhekî din ve guhestina wî, dewirkirin, hewandin yan teslîmsitandin dê wek "bazirganîya mirovî" bê qebûlkirin.
- (d) Her kesê ji hijdeh salan piçûktir be, dê wek "zarok" bê qebûlkirin.

Ev binavkirina hevpar a di bihevxistinên Encûmena Ewropayê û Neteweyên Yekbûyî de ye ji bo pêkhatina qaçaxçîtîya mirovan wek lêkerê navgîn, lêkerê mebest û bizava sûcî sê hêman xuyandine. Her çend di pêkanînê de û çarçoveya têgihî de **qaçaxçîtîya koçberan** û **bazirganîya mirovan** gelekê caran bi yek maneyê bi kar bê jî ev awa rast nîne. Qaçaxçîtîya koçberan bazirganîyek e ku di nav qaçaxçîyî û koçberî de têkilîyeke bi buhurîna ji sînorî bi dawî tê bi nav dibe lê têkilîya nava bazirganê mirovên û ziyandîtîyên bazirganîya mirovan bi awayê ku bazirgan, ji mirovî her tim karekê bi dest dixe û keda wî dixwe tê binavkirin.[4]

Bazirganîya zarokan

- Sûcekî wisan e ku dibe bi mebesta kedxwarîyê ji derekê ber bi cîhekî din ve veguhestina zarokî û kirîn û firotina wî, dewirkirina wî, vehewandina wî yan teslîmsitandina wî be.
- Gava mijar zarok be, nayê pirsîn ka amadekirin, xapandin, tesîrkirin yan erêdanî heye yan yan tune ye, tê qebûlkirin ku sûc pêk hatiye.[5]

Peymana Tevgera Dijî Bazirganîya Mirovan a Encûmena Ewropayê, bazirganîya mirovan wek binpêkirineke mafê mirovan bi nav dike. Di vê rewşê de jî berpirsîyarîyên wek alîkarîya ziyandîtîyan, parastina mafên mirovên ziyandîtî û hûrbûyîna li ser wan dixe sitûyê Dewletên alîgir. Astengkirinên taybet û yên girêder, parastina şahidan, sazkirina çarçoveya qanûnî, dabînkirina hebûna sazgêrîya çavdêr a serbest vê Peymanê giring dikin.

Di çarçoveya vê peymanê de berpirsîyarîyên Dewletên alîgir ev in: [6]

Berpirsîyarîyên dewletên alîgir:

- Binavkirina ziyandîtîyî (wek nimûne; eger li ser temenê ziyandîtîyî nexuyayîyek hebe divê ziyandîtî wek zarok were qebûlkirin);
- Ji bo zarokan sitandina tedbîrên taybet ên astengkir;
- Li dijî daxwazên bi îstîsmara cinsî, xebitandina bi zorê yan bi zorê pêdana xizmetkirinê, koletî û pêkanînên wek koletîyê, ebdîtî û sitandina endaman re têkildar astengkarî û pêkanîn;
- Parastina jîyana taybet a ziyandîtîyan; (wek nimûne ji alî raya giştî ve nehiştina hînbûna nasnameyên zarokên ziyandîtî yan hûrgilîyên dikin nasnameyên wan bên tesbîtkirin, sitandina tedbîran)
- Ji ziyandîtîyên bazirganîya mirovan re dayîna tevdîrên destek ên ku mafê wan ê feydedîtinê heye; (Wek nimûne, sitara maqûl û ewle, digel alîkarîya derûnî û pereyi pêdanzanîna ziyandîtîyî, ji bo zarokan

4 Toolkit to Combat Trafficking in Persons, UN Office on Drugs and Crime New York, 2008, s. 4.; Ragihandina Neteweyî ya TİHEKê r.14.
5 İMadeyê 3c-yê Lihevkirina li ser Cezakirin û Rawestandin û Astengkirina Bazirganîya Mirovan, Xasma Bazirganîya Zarokan û Jinan, Madeyê 4c-yê Lihevkirina Encûmena Ewropayê ya Bizava li Dijî Bazirganîya Mirovan, Madeyê 80.3-yê QCT, Ragihandina Navenda Zarokan a Navneteweyî, Amadekar: Adem Arkadaş Thibert, Gulana 2019an
6 Têbînîya zanyarîya Encûmena Ewropayê: https://cocukhaklariizleme.org/yayin/insan-ticaretine-karsi-eyleme-iliskin-avrupa-konseyi-sozlesmesi

pêkanîna gihana hînbûnê)
- Ji ziyandîtîyên ku li ser axa alîgirekî ne bi kêmayî 30 roj dayîna mafê başbûnê û fikirînê;
- Ji zîyandîtîyên bi awayekî ne qanûnî li ser axa alîgirekî ne bihevxistina mafê rûniştinê; (Wek nimûne ji bo ziyandîtîyan bi awayê li feydeya herî baş a zarokî re dayîna destûra rûniştinê û di rewşên rewa de bi heman mercan nûkirina wê)
- Tezmînkirina zirarên ku hatine dayîn ziyandîtîyên bazirganîya mirovan; (Wek nimûne dabînkirina ziyandîtîyan ji bo ew dozê li kirdeyên bazirganîya zarokan bikin)
- Bihevxistinên ji bo vegerandina ziyandîtîyan ber bi welatê wan bixwe ve yan vegera wan; (wek nimûne gava desthilatdar biryara vegera zarokekî bidin pêşîn guh bidin feydeya mezin a zarokî, berî pêkanîna tevdîreke vegerandinê kirina nirxandineke li ser eger zarok bê vegerandin dewletekê ka dê çi xeter hebin)
- Di sînoran de ji bo çêtir birêvebirina kontrole û li ser kontrola sînorî ji bo hevkarîyê sitandina tevdîran;
- Pêkanîna başbûna belgeyên geştê û nasnameyî û ji bo parastina rastî û ewlehîya belgeyan sitandina tevdîrên divên;
- Qanûnîbûn û rewabûna kontrolkirina belgeyên geştê yan nasnameyî yên bi destê wan hatine çêkirin yan angaşta wan tê kirin ew ji alî wan ve hatine çêkirin, eger ji alî kesekî din ve bê xwastin û guman bê kirin ew belge ji bo bazirganîya mirovan bi kar tên, kontrolkirina wan;
- Hay ji alîyê nihêrtina regezê bûyîn;
- Ji ber sebebên jimartî sitandina tevdîrên qanûnî û/yan pêkanîna wan ku ceza neye dayîn ziyandîtîyan
- Bihevxistina keysa ku bêyî vêyana gilîkirina ziyandîtîyan di çarçoveya peymanê de sûc bên dadgehkirin;
- Ji ziyandîtîyan, yên bi meqamên edlî re hevkarîyê kirine, şahidan û malbatên wan re ji bo peyderkirina parastina rewa sitandina tevdîrên divên;
- Sitandina tevdîrên ji bo ku kes û yekine li dijî bazirganîya mirovan bibizivin û ziyandîtî bên parastin bibin pispor;
- Lihevanîna kirdarîyên dadgehîkirinê bi parastina veşarîbûna ziyandîtîyan ewlehîya wan;
- Li ser hîmê belgeyên têkildar ên Navneteweyî û herêmî, bihevxistinên yeknesak û dualî yên fermanên qanûnî yên qebûlkirî û li gora hiqûqî neteweyî rewa bin, bi alîyên din ên peymanê re kirina hevkarîyê;
- Di nava meqamên neteweyî, desthilatdarên dewletê û civata sivîl de ji bo berpirsîyarîyên bi sebebê peymanê pêkhatî, pêkanîna sazkirina nîvekarîya strategîk;
- Nekirina hîç lihevkirineke ku li dijî peymanê be.

DÎTINÊN BAZIRGANÎYA MIROVAN

- Fihûş û Îstîsmara Cinsî
- Bazirganîya Endaman û Şaneyan
- Zewicandina bi Zorê
- Parspêkirina bi Zorê
- Kedxwarîya Kedê
- Leşkerên Zarok[7]

BI RÊYA FIHÛŞÊ Û ÎSTÎSMARA CINSÎ BAZIRGANÎYA JINAN Û ZAROKAN

Bazirganîya jinan a ku em dikarin wê wek bazirganîya mirovan a bi mebesta kedxwarîya cinsî jî bi nav bikin, di Biryara Çarçoveyî ya Encûmena YE-yê de weha hatiye binavkirin:

Bazirganîya mirovan a bi mebesta îstîsmara cinsî: Ku kesek bi zorê, bi bikaranîna hêzê yan gefê yan revandinê, qilopilo yan bi xap, bi xerabî bikaranîna desthilatê yan kesek bêçare be û bijareyeke wî ya din a rast û dikare bê qebûlkirin tune be û neçarî rasthatina îstîsmarê be û jê bê feydedîtin yan ji kesekî din î li ser wî kesî xwedanê desthilatê be ji bo aferîna wî kesî ji bo pere yan feydeyeke din pêşnîyazî bê kirin yan li gora erêkirinê ew kes bi kêmayî bi zorê bê xebitandan yan xizmet pê bê kirin, rastî koletîyê yan pêkhatinên wek koletîyê bibin yan bên dîlgirtin jî di nave de bi fihûşê bê îstîsmarkirin û rastî nîşandana pornografîk yan berhemanîna materyalê pornografîk, ji bo awayên din ên îstîsmara cinsî pêk bê bê amadekirin, veguhestin,

7 Ev awayên dîtinê di Ragihandina Neteweyî ya TÎHEKê de tên vegotin.

dewîrkirin, desthilata li serê jî dest bigherîne, bê hewandin û dû re bê qebûlkirin.[8]

Ji ber vê biryara şîretî, Komîteya Wezîran ji dewletên alîgir re gotiye ew divên bazirganîya mirovan di qanûnên cezayî de wek sûc qeyd bikin, ji bilî vê vegerandina sûckirîyan hêsan bikin û ji bo têkoşîna bandêr, ceza di tenga herî bilind de bên dayîn.[8]

Bazirganîya jinan bi tenê wek fihûş û îstîsmara cinsî dernakeve pêşîya me. Di vê mijarê de materyalên pornografik û bi zorê xebitandina di bazara kêfkirinê de awayên din ên bazirganîya jinan in. Ji van sûcên han bi qasî jinan LGBTI+ û zarok jî tesîrê dibinin.

Komeke din a resen a divê herî pirr ji bazirganîya mirovan a bi mebesta cinsî bê parastin jî zarok in. Ji vî alîyî ve ne bi tenê Peymanên Neteweyên Yekbûyî û Encûmena Ewropayê, Peymana Lanzorete ya Encûmena Ewropayê jî xwedîyê avahîyeke hiqûqî ya giring a li dijî bi mebesta cinsî îstîsmarkirina zarokan û bazirganîya vê yekê ye.

Peymana Lanzarote ji Peymana Mafên Zarokan cuda, cara pêşîn îstîsmara cinsî bi nav dike.

Peymana Mafên Zarokan dibêje zarok divên ji her cûrê îstîsmara cinsî bên parastin lêbelê Madeyên 18-23 yên Peymana Lanzarote bi awayê herî fireh dibêje îstîsmara cinsî ya zarokan çi ye.

Li ser fihûşa zarokan Peymana Mafên Zorakan vêyaye ku divê fihûşa îstîsmara zarokan bê astengkirin lê PMZ rastî rexneyan hatiye ku ew ji alîyê têgihî ve kêm dimîne, ev îfade dibe wisa bê fehmkirin ku u zarok ne bi îstîsmarê di fihûşê de dibe bê bikaranîn. Ji vî alîyî ve Peymana Lanzarote dîsa têgiha fihûşa zarokan bi awayekî fireh wek bêyî nihêrtina li peredayîn, soz, yan gerew bê dayîn zarokî yan kesekî din bê nihêrtin, di gerewa pere yan tiştekî gerew de bê soz dayîn û bi vî awayî ji bo bizavên cinsî bikaranîna zarokî bi nav dike.

Dîsa di madeyê 34an ê Peymana Mafên Zarokan de behsa îstîsmara wan bi awayê bikarhatina nîşandayînên û melzemeyên pornografik bê kirin jî bi awayekî girêder nehatiye binavkirin. Lê madeyê 20/2yê Peymana Lanzarote, pornografîya zarokan bi awayê "her çi materyaleke ku zarokî bi awayekî rast yan temsîlî eşkere di nava tevgereke cinsî de nîşan bide yan endamên cinsî yên zarokan wek esas bi awayekî cinsî nîşan bide" bi nav kiriye. Madeyê 20(1) ê Peymana Lanzarote "berhemanîna pornografîya zarokan; pêşkêşkirina pornografîya zarokan û temînkirina wê, belavkirina pornografîya zarokan û gihandina wê; ji bo kesekê bixwe yan ji bo kesekî din temînkirina pornografîya zarokan û bi zanîn tevlîbûyîna pornografîya zarokan" wek sûc qebûl dike.

Ramana pêşîn a ku li ser materyalên bi tiştên cinsî yên ku zarok ew bixwe çê kirine eşkere kiriye jî dîsa ji alî Encûmena Lanzarote ve hatiye amadekirin. Ev ramana tarîxa 2019an di mihwera parastina zarokî de hatiye amadekirin û tê de şîretin hene ku zarok, regezîya xwe bi rêya teknologîyên zanyarî û têkilîkirinê vebînin, ji bo hev bi mebesta bikaranîna kesîn materyalên di wan de tiştên cinsî hebin hay ji xwe hebin û ew bên parastin. Di vê mijarê de bi kirpî hatiye vegotin ku zarok di nava xwe de materyalên bi têdeyîya cinsî bidin û bistînên ew divê bi zîzî bê nirxandin, di rewşên wek weha de dibe bibe pornografîya zarokan, ji bilî van xwastina bixwe ya zarokan hêsantir e, bi hêsanî dibin bibin mebest û ji îstîsmara cinsî re bêtir rê di wan de heye, neyê hiştin ku materyalên bi têdeyîya cinsî ji bo demeke dirêj zirarê bidin zarokan. Tevlî vê yekê, li gora Ragihandina Eşkerekarîya Peymana Lanzarote li ser hatiye kirpandin ku eger zarok di nava xwe de û ji bo bikaranîna taybet têdeyîyên wek pornografîya zarokan çê bikin lê dû re van têdeyîyan li ser torê eşkere bikin yan belav bikin û bi vî awayî sûc bikin, divê proseya cezayî ya vê yekê li ser hîmê parastina zarokan bê birêvebirin.

8 https://rm.coe.int/CoERMPublicCommonSearchServices/DisplayDCTMContent?documentId=09000016806489a0

BAZIRGANÎYA ENDAMÎ Û TEVNÎ

Lihevkirina Palermo wek îstîsmareke di çarçoveya bazirganîya mirovan de sitandina endaman jî jimartiye, ji ber vê yekê qaçaxçîtîya ji alî endaman ve jî nexasim bextxwaz û zarok komeke bêtir bêparastin û tîzek û bi xeter in.Lihevkirina Palermo jî Peymana Lanzarote jî ne ji vêyana zarokî, ji vîyana wî ya sazkirî behs dike. Ji ber ku dibe vêyana kesên endam ên tîzek dibe bê berterefkirin, erêkirina ji bazirganîya mirovan re û dîtinên wê yên cuda re divê wek erêkirina kesî neye fehmê.

ZEWICANDINÊN BI ZORÊ

Sazgêrîya herî giring a mafê zarokan di warê zewacên temenpiçûk û yên bi zorê de parastina zarokan e. Ji vî alîyî ve yek ji dîtinên bazirganîya mirovan ên ji alîyê jinan, zarokan û bextxwazan ve zewacên bi zorê ne. Bazirganîya mirovan êdî ji bo Ewropayê bûye yek ji teşqeleyên herî mezin û bi pêla koça hinbihin bêtir dibe êdî hatiye tengeke kesnedîtî. Di mihwera biryarên Encûmena Ewropayê ya ku dibêje bazirganîya mirovan awayekî nû yê koletîyê ye de em dikarin bibêjin ku yek ji hîmên herî giring bi zewacên bi zorê pêk tê. Ji bilî vê, madeyê 4an ê Peymana Mafê Mirovan a Ewropayê gava bazirganîya mirovan vedibêje tevlî têgiha koletîyê li serê radiweste.

Nivîsîngeha Madeyên Hişbir û Sûcan a Neteweyên Yekbûyî jî qebûl dike ku zewaca bi zorê jî navgîneke bazirganîya mirovan e. Li gora Ragihandina Neteweyên Yekbûyî zarokên qîzî yên ji dozdeh salan piçûktir bi zorê bi mêrên ew wan di têkilîya cinsî û karên malê de îstîsmar dikin re tên zewicandin yan tên xapandin. 'Zewac', dibin ji alî endamên malê, wekîlên zewacê yan simsaran ve gelekê caran ji bo qezenca pereyi bên bihevxistin yan zarokên keçî tên revandin.[9]

Çarçoveya têgihî ya di nava zewicandina bi zorê û bazirganîya mirovan de dibe li gora Peymana Pêvekî ya bi tarîxa 1956an de ya Li ser Rakirina Koletîyê de bê xêzkirin. Li gora vê yekê di "pêkhatinên wek koletîyê" de dîlgirtina ji bo deynan, ji bo îstîsmarkirinê firotina zarokan, serftî û awayê zewaca wek koletîyê hene.[10] Ev awayên zewacê wek awayê jêrîn hatiye binavkirin:

Her çi dezgehek yan pêkhatineke wek jêrîn:

- (i) Bêyî ku mafê erênekirina jinekê hebe pere yan tiştekî wek pere tê dayîn dêûbavên wê, welîyê wê, malbatê wê yan her çi kesek yan komekê û sozê zewicandinê tê dayîn; yan jî
- (ii) Mêrê, malbata yan 'eşîra jinekê di gerewa bihayekê de yan bi awayekî din mafê xwe yê dewirkirina wê heye; yan jî
- (iii) Jinek, piştî mirina mêrê wê ji alîyê kesekî din ve bivênevê wek mîras were sitandin.

Li dijî zewacên temenpiçûk û yên bi zorê tevlî çarçoveya qanûnî ya hîmê wê hem li ser Qanûnê Medenî û hem jî li ser Qanûnê Cezayî yê Tirkîyeyê, mijar, divê ji alîyê bazirganîya mirovan ve bê fikirîn. Ji vî alîyî ve yek ji hêmanên binavkirina jorîn yan çend ji wan hebin em behsa bazirganîya mirovan a zewicandina bi zorê dikin.

PARSPÊKIRIN

Di ragihandinên navneteweyî de gelekê caran tê dibîranîn ku ziyandîtîyên bazirganîya mirovan di têkilîya zewacê de dibin rastî îstîsmarên herî ciddî yên wek îstîsmara cinsî, destdirêjî yan bi zorê bihemilhiştinê, qewraştîyê, parspêkirina bi zorê yan bi zorê pêdankirina sûcî bibin.

Parspêkirina bi zorê wek ziyandîtîyên ku nikarin xwe ji alî gîyanî û laşî ve bi rê ve bibin nîşanî her kesî tên kirin û ji wan hatinî tê bidestxistin, tê binavkirin.[11] Parspêkirina kesî bi serê xwe sûcê bazirganîya mirovan pêk neyne jî eger bi mebesta parspêkirinê serdana kirinên navgîn û mebest be, sûcê bazirganîya mirovan pêk tê.

9 https://www.unodc.org/documents/humantrafficking/2020/UNODC_Interlinkages_Trafficking_in_Persons_and_Marriage.pdf
10 INTERLINKAGES BETWEEN TRAFFICKING IN PERSONS AND MARRIAGE, r.18.
11 Ragihandina TİHEKê r. 17.



Sûcê bazirganîya mirovan; ji bo gihana kirina mebest, bi rêya kirinên navgîn pêkanîna kirina sûcî pêk tê. Di her hêmaneke wê de pêşîn kirineke navgîn û mebest heye û ev kirin ber bi kirina sûcî ve diçe.

XWARINA KEDÊ

Li gora Koma Pisporên Tevgera Dijî Bazirganîya Mirovan GRETA-yê bazirganîya mirovan a bi rêya xwarina kedê bi vî awayî pêk tê:

Koma Pisporên Tevgera Dijî Bazirganîya Mirovan (GRETA)yê têgiha kedxwarîyê;

- Xebitandina bi zorê
- Xizmetpêkirin
- Koletî
- Pêkanînên wek koletîyê
- Xizmetkarî, bi zorê xebitandina di karê malê de

Ev hêman di madeyê 4an ê Peymana Mafê Mirovan a Ewropayê de û îctîhada Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) de jî tê qebûlkirin.

Alîyekî vê yekê jî karkirên zarok in û çarçoveya hiqûqî ya di heqê wan de jî bi vî awayî ye:



LEŞKERÊN ZAROK

Bazirganîya mirovan a bi rêya zarokên leşker a bi xebatkarîya zarokan re tê têkildarkirin, yek ji binpêkirinên herî hîmî yên mafên zarokan e.

Peymana ILO ya bi jimara 182 vê yekê bi vî awayî daye zanîn: ***"hemû awayên koletîyê yan wek koletîyê yên wek bi awayê ku di pevçûnên leşkerî de zarok, yan bi zorê yan jî bi mecbûrkirinê bi kar bên jî di nav de, bi zorê yan bi mecbûrkirinê xebitandina wan"***

Di daneyên 2024an ên Neteweyên Yekbûyî yên ragihandina paşîn a ku bazirganîya mirovan daye zanîn de jêrsernivîsên giring ev in:



Gava ev dane bên xwandin, tiştekî din î divê mirov hay jê hebe jî ew e ku her wekî ku li jorê jî bi nav bû, ji ber ku li holê sûcek heye nirxandinên li ser bazirganên mirovan in. Her çend Encûmena Wezîran a Konseya Ewropayê vêyana têkoşîna bi bazirganîya mirovan bi rêya mekanîzmayên hiqûqê cezayî û mercên ji bo vegerandina sûckirîyan hêsankirina li ser bazirganên mirovan behs bikin jî ji alîyê nirxandina xeterê ve ji bo fînotaypa sûckirîyî bê fehmkirin, ev yek giring e.

12 Dane: https://www.unodc.org/documents/data-and-analysis/glotip/2024/GLOTIP2024_BOOK.pdf

Li gora nirxandina Neteweyên Yekbûyî, gelekê bazirganan di nava komên birêxistî de tevdigerin. Li gora ji sedî yekê nirxandina dozan, bazirganên di van dozan de di nava têkilikireneke sûcî de bi awayekî sist komên bi hev ve girêdayî ne û wek tor in yan jî kokên wan li derveyê welêt in û dezgehên sûcî yên sazkirî ne.

Em ji daneyên ji dozan wergirtî ne dibinin ku bêtir jî awayekî sûckirinê yê ji alî torên sist ve mebesta mijarê ye:

Jimara Navînî Ya Qurbanîyên Ku Di Vegotinên Dozê De Li Gorî Awayê Sazkarîya Qaçaxçîyan Hatiye Ragihandin



Jêder: berfirehkirina kurteyên dozên dadgehî yên UNODCê

Welatên buhurê û guzergeha bazirganîya mirovî jî di warê têkoşîna di sûcî de yek ji sernîvîsên herî giring e:

Xerîteya 1î Herikîna serekî ya Serherêmî, 2022 (yan jî ya herî paşîn)



→ Herikînên serherêmî: Zîyandîtîyên li welatên gihîştinê hatine tesbîtkirin

⇢ Herikîna serherêmî: kêmtirî %5ê ziyandîtîyên li welatên gihîştinê hatine dîtin

Sînor û navên hatine nîşandan û nîgarên ku li ser vê nexşeyê hatine bikaranîn ne ku ji alî Neteweyên Yekbûyî ve erêkirî ne yan erêkirinên fermî ne.

Jêder: UNODC hûrgilîkirina daneyên neteweyî

TÊKOŞÎNA BI BAZIRGANÎYA MIROVAN RE Û PARASTINA ZIYANDÎTÎYAN

Çarçoveya ku GRETA li ser ziyandîtîyên bazirganîya mirovan yan kesên di xeterê de ne saz kiriye li ser wan kesan e ku ew ziyandîtîyên bazirganîya mirovan in yan xetera tiştekî wan î wisa heye, ew li Dewleteke ku ne welatî ne yan her tim rûnanên mafê wan ê parastina navneteweyî hebe.[13] Mafê parastina Navneteweyî, gava her çi kesek li derveyê Dewleta ku ew bixwe hevwelatîyê wê ye yan welatê bere lê jîyaye yan li derveyê dewletê, mafê parastina navneteweyî ji bo her kesekî heye ku ew li derveyê Dewleta hemwelatîbûna xwe ye yan jî berê lê rûdiniya yan jî ya dewleta ku lê maf û mercên hemwelatîbûnê hene ku bi dewletekê ve girêdayî ne, eger ew neçarî vegera li wê dewletê bibe vegerê li ser jiyana wî an azadîyên bingehîn xetereke dijwar peyda bibe.[14]

Lê di hindek rewşan de kesek dibe di nava welatê xwe de ziyanê dîtibe û revîyabe welatekî din. Di vê rewşê de eger ew ji bo vegera li welatê wî bê neçarkirin, wê gavê ji ber ku dê gef li jîyana wî û mafên wî yên hîmî bê xwarin, dibe mafê parastina navneteweyî bi dest bixe û bi hêmana non-refoulment (venegerandin)ê bê parastin. Di rewşên weha de li giringîya zordarî, tundî û îstîsmara berê di serê wî kesî re buhurîye tê nihêrtin û li gora wê yekê nirxandina xeterê tê kirin.

Hêmana venegerandin (non-refoulement)ê hêmana hîmî ya hiqûqê bextxwazîyê ye û di xala 1ê madeyê 33yê Peymana Li ser Statuya Hiqûqî ya Bextxwazan (1951) tê bikeyskirin: "Tu Welatekî Alîgir, bextxwazekî ji ber nîjada wî, dînê wî, welatîbûna wî, endamtîya wî ya komeke civatî ya xuyayî yan ramanên wî yên siyasî, bi her çi awayî be bera bibe dê venegerîne ('refouler') sînorên welatekî ku dê gef li wê derê li jîyana wî yan serbestîya wî bê xwarin.

Lihevkirina Encûmena Ewropayê ya Li ser Bizava li Dijî Bazirganîya Mirovan, bi tevdîrên ji bo parastina ziyandîtîyan Hevkarîya Navneteweyî sozê hevkarîyê daye. Mebestên lihevkirinê; rêlibergirtina bazirganîya mirovan û têkoşîna pê re, parastina mafên zîyandîtîyên bazirganîya mirovan û tevlî vê yekê dabînkirina lêpirsînê û bipeyketinê û di mijara bizava li dijî bazirganîya mirovan de teşwîqkirina hevkarîya navneteweyî ye.[15]

Li Tirkîyeyê hem di warê mekanîzmayên rêlebergir û hem yên parêzkar de keftelefta sazkirina çarçoveya têkoşîna bi bazirganîya mirovan re tê kirin.

Di serî de di sala 2002yan de bi ahenga Wezîrîya Karên Derve, Hêza Peywira Têkoşîna bi Bazirganîya Mirovan re hatiye avakirin.

Qanûnê Cezayî yê Tirk di vê mijarê de parastineke hiqûqî ya giring e:

Bazirganîya Mirovan, Madeyê 80yî

1. **(Têvel: 6/12/2006 – md. 5560/3)** Bi mebesta xebitandina bi zorê, xizmetpêkirin, pêkirina fihûşê yan dîlgirtin yan dabînkirina endamên laşî, pêkanîna gefê, pêkolîyê, kirina bi zorê yan tundîyê, bi xerabî bikaranîna desthilatdarîyê, xapandin yan bi awayê bidestxistina erêkirina kesan bi awayê feydedîtina bêçareyîya yan keysên çavdêrîya li ser kesan, kesan bixe nava welêt, derbixe derveyê welêt, karê wan bike, wan birevîne, wan ji cîhekî veguhêze cîhekî din yan bişîne yan vehewîne, dê ji heşt salan ta dozdeh salan cezayê zîndanîkirinê û ta dehhezar roja cezayê pereyî yê edlî bê dayînê.
2. Gava kirinên bi mebesta di xala yekî de pêkhatî û vî sûcî pêk tînin hebin, erêdanîya ziyandîtîyî nelê ye.
3. Eger yên ji hijdeh salan piçûktir bin bi mebestên di xala yekî de xuyandî bên karkirin, revandin, ji derekî ber bi derekî din ve bên veguhestin, bên şandin yan bên hewandin, hîç kirinake navgînî ya li ser sûcî nehatibe pêkanîn jî dê cezayên di xala yekî de xuyandî li kirdarî bên birrîn.
4. Ji ber van sûcan tevdîrên ewlehîyê li ser kesên hiqûqî jî tên pêkanîn.

Di Ragihandina ku Koma GRETA di sala 2019an de li ser Tirkîyeyê nirxandina pêkanînê kiriye de rexne li vî hukmî hatiye girtin. Ev hukim, bizava amûrî ya ***"pêşkêşîya qezencê yan feydeyê ji kesekî yan kesên din re ji***

13 Guidance note on the entitlement of victims of trafficking, and persons at risk of being trafficked, to international protection
14 Age, s.3.
15 Madeyê 1î yê Peymana Bizava li Dijî Bazirganîya Mirovan a Encûmena Ewropayê

bo bidestxistina razîbûna kesên ku kontrola wan li ser kesekî din heye" ku di Protokola Palermo de ye naxe nava xwe tenga hêz û tundîyê nehatiye nişandan û eger ji ber encama birîndarbûna bi zanîn bibe sebebê şert û mercên giran, her du made jî di nav de nînin. Yan jî ji bo bidestxistina razîbûna kesên ku kontrola wan li ser yên din heye feyde bibînin, ji çarçoveyê tên derxistin.[16]

Piştî ragihandina GRETA-yê wek karên lihevanîna bi hiqûqê Navneteweyî, di tarîxa 10/6/2020î de di madeyê 7an ê Biryarnameya Serekdewletîyê ya li Ser Destekkirina Ziyandîtîyên Sûcî sazkirî, di behsa xizmetên ji komên şikestok re bên dayîn, ziyandîtîyên bazirganîya mirovan jî di nava wan de ne.

Lihevkirina Encûmena Ewropayê ya Li ser Bizava li Dijî Bazirganîya Mirovan, çarçoveya ku wê ji bo bazirganîya mirovan saz kiriye, kirine sê xal:



Madeyên 5an û 6an ên Peymanê li ser bergirîyên bergir in lê madeyên 7-8 û 9an li ser ewlehîyê, hevkarîyê û kontrolê ne. Di vê beşa ku tê de xurtkirin û sazkirina hevkarîya di tenga neteweyî di nava endamên cûrbicûr de têkoşîna bi bazirganîya mirovan û astengkirina bazirganîya mirovan berpirsîyarîyên texmînên tevdîrên alîgir tê de hene de bi berpirsîyarîyên civatî, edlî û birêvebirî ji hikûmetan re; polîs re, dezgehên ji koçê û gumrukan berpirsîyar in, dezgehên civata sivîl re, dezgehên din ên ji mijarê berpirsîyar in û Yekîneyên din ên civata sivîl re peywira birêxistinê hatiye dayîn.

Peyman, alîyan mecbûr dike ku ew ji bo ku mirov karibin bi awayê qanûnî koç bikin bergirîyên di cîh de pêk bînin, gazî wan dike ku kesên dibin bibin koçber jî keysên qanûnî, keysên karpêdanê, ji alîyê maf û peywiran ve hînkirina bêtirkirina zanînê pêk bînin. Ji bilî vê yekê dê ev awa bike ku komên şikestok pêşnîyarîyên bazirganên mirovan fehm bikin û di şûna erêkirina ji wan re de ji bo ku ew a rasttir bizanin û li dijî zanîyarîyên şaş ên ku bazirganên mirovan tevbigerin û têgiha erêkirina sazkirî pêk were. Nexasim nivîsîngehên vîzeyê û koçberîyê mebesta hîmî ne.

UNICEF, rêbazên hîmî yên ku zarokan ji bazirganîya mirovan biparêze ji bilî vê yekê pê dike ser van xalan jî:

- Ji tevgerên neyînî, adetan, tevgerên mirovan û pêkanînan parastina mafên zarokan;
- Sozên hikûmetan ji bo mafên zarokan û parastina zarokan û pêkanîna wan;
- Karkirin û pêkanîna bihevxistinên parêzkar;
- Ji bo parastina zarokan, kapasîteya zarokan, malbatan û yên bi toman re têkilî dikin û têkildar dibin;
- Hunerên jîyanî yên zarokan, zanînên wan û tevlîbûyînên wan
- Avakirina sîstemeke ji bo çavdêrîya li ser bikaranîna bi xerabîyê û ragihandina wan;
- Bername û xizmetên keysê didin zarokên ji bazirganîya mirovan zîyandîtî baş bibin û dîsa tevlî civatê bibin.

16 Greta, Report Concerning The Implementation of The Council of Europe Commission on Action Against Trafficking in Human By Turkey, First Evaluation Around, 2019, p. 2

Madeyê 39an ê Peymana Mafên Zarokan jî zarokan ji vî alîyî ve diparêze û tê de tê xwastin ku zarokên ziyandîtî miftîbelaş karibin xwe bigihînin xizmetên hiqûqî û baş bibin û ji alî civatî ve ji nû ve li civatê werin, ji bo ku karibin ji xizmetên şîretkarîyê yên xwedîtîya leşsaxîyê ya herî baş feyde bibînin ji desteka pereyi û keysên hînbûnê feyde bibînin.

Tevlî kirdarîyên qanûnî yên têkildar, divê veşarîbûn û nasnameyên ziyandîtîyên bazirganîya mirovan bên parastin.

Madeyê 6an ê Peymanê dibêje mebesta van bergirîyan pêximkerî ye û wek awayekî bergirîyê li ser bergirîyên kêmkirina xwastinê jî radiweste.

Peymana ku li ser alîyan ji bo bergirî û pêkanînên li dijî îstîsmara cinsî, xebitandina bi zorê yan pêdana xizmetkirina bi zorê, koletî û pêkanînên wek kolîtîyê, ebdîtî û derxistina endaman, astengkirina bazirganîya mirovan bi awayê erênî ferz kiriye û ji bo têkoşîna bi bazirganîya mirovan re li ser giringîya destwerdana daxwazê rawestîyaye.

Avahîya ku hemû çarçoveya navneteweyî pêşkêşî me kiriye jî ji alîyekî ve bi bazirganîya mirovan û awayên resen ên bazirganîya mirovan re têbikoşin û hem jî hay ji taybetîyên resen ên komên şikestok ên têkildar hebin, hem jî hay ji mekanîzmayên navneteweyî hebin û hem jî bi yên neteweyî re tevbigerin.

Ji vî alîyî ve avahîya hîmî divê bi vî awayî bê sazkirin:



Avrupa Birliği ile birlikte ortak finanse edilmektedir

AVRUPA BİRLİĞİ

COUNCIL OF EUROPE

CONSEIL DE L'EUROPE

Avrupa Konseyi ile birlikte ortak finanse edilmekte ve uygulanmaktadır

ULUSLARARASI ÇOCUK MERKEZİ